

## PAPER DETAILS

TITLE: Rêyên Pakkirina Trawmayê Di Romanêن Bextiyar Elî Da

AUTHORS: Leyla Polat

PAGES: 103-126

ORIGINAL PDF URL: <https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/4339926>

# Rêyên Pakkirina Trawmayê di Romanêñ Bextiyar Elî da\*

## Methods of Healing Trauma in Bextiyar Eli's Novels

**Leyla POLAT**

Leyla POLAT | <https://0009-0005-5201-6463> | zelalzeref@yahoo.com

PhD. Candidate at Bingol University, Institute of Living Languages in Türkiye,  
Department of Kurdish Language and Culture, Bingol, Türkiye

**Citation:**

Polat, L. (2024). Rêyên Pakkirina Trawmayê di Romanêñ Bextiyar Elî da. *Nubihar Akademi* 22, 103-126. DOI: 10.55253/2024.nubihar.1579363.

Article Type	Research Article
Submission Date	04.11.2024
Acceptance Date	28.11.2024
Publication Date	31.12.2024
Peer-Review	Double anonymized - Two External
Ethical Statement	It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.
Plagiarism Checks	Yes – iThenticate
Conflicts of Interest	There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.
Complaints	The author(s) has no conflict of interest to declare.
Grant Support	The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.
Copyright & License	Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the <b>CC BY-NC 4.0</b> .

**Puxte**

Piştî gelek trajedyen ku di sedsala nozdehan da pêk hatin, têgeha "trawma"yê ji maneya 'birîna laş' maneyeke firehtir û di heman demê da pîvaneke navdîşiplînî jî bi dest xist. Nîqaşen li ser têgeha trawmayê her ku çû berfirehtir bûn. Ji bo danasîna şert û mercen psîkolojik hat bikaranîn ku berê nehatibûn teşxîskirin. Qaziyen ku ji Şerê Cîhanî yê Yekem û yên ku ji Vietnamê vegerîyabûn; şahid û mexdûrên Holokoustê, kolonîzekirina Afrîkayê û postkolonyalîzm, gelek şerîn berdewam, statuya gelên bindest, şexs

\* Ev gotar ji teza doktorayê ya bi navê "Trawma di Romanêñ Bextiyar Elî da" ya Leyla Polat hatiye dariştin.

û kolektîfên xwedî dezawantaj, guhertinê avûhewayê, femînm û gelek meseleyên civakî yên din bûn fokûsa xebatê trawmayê. Lékolîner û rexnegiran, ji xeynî psîkolojî û psîkanalîzê di gelek warê din da jî gelek mesele di çarçoveya trawmayê da hilsengandin. Yek ji wan qadan jî edebîyat bû. Bi taybetî li gorî lêkoler û rexnegirîn edebiyatê, hêza edebiyatê hebû ku bûyerên trawmatîk û bandorêwan ji konteksta wê ya rasteqin derxe û di nav fîksiyonê da temsîl bike; aqlêselîm û empatîyê saz bike; bandora pakkirinê ya vegérânê bi kar bîne, nivîsê û xwendinê wekî alaveke şîfayê bi kar bîne. Mafê axivtinê bide êndin. Di vê xebatê da hat armanckirin ku di çarçoveya lêkolînê trawmayê da pênc romanê Bextiyar Elî yên bi navê *Hinara Dawî ya Dinyayê, Qesra Balîndeyên Xemgîn, Êvara Perwaneyê, Bajarê Mosîqarê Spî û Apê Min Cemşîdxan Ku Hertim Bê Li Ber Xwe Dibir* di konteksta rîyên pakkirina trawmayan da bêñ hilsengandin. Ev xebat di her pênc romanen da rîyên pakkirina trawmayan ci ne, wan rîyan vedikole û pê ra jî trawmaya van romanen vedikole bê ka ji bo pakkirina trawmaya gelekî ci erkê didin ser pişta xwe. Di encamê da eş-kere bû ku karakterên Elî tu caran derfetên therapeutic (terapotik) û psîkyatrîk ên pakbûnê bi dest naxin û bi rîya: rîwîtî, hogirtî, şîngirêdan û nivîsîne pak dibin.

### Peyvîn Sereke

Trawma, pakkirin, Bextiyar Elî, rîwîtî, hogirtî, şîngirêdan, nivîsîn.

### Abstract

After many tragedies in the nineteenth century, the concept of "trauma" gained a more comprehensive and interdisciplinary meaning than "physical injury". Discussions on the concept have increasingly gained a broader dimension. It has been used to indicate some previously undiagnosed psychological conditions and circumstances. Veterans returning from World War I and Vietnam, witnesses and survivors of the Holocaust, the colonization of Africa and postcolonialism, many ongoing wars, the status of colonized peoples, disadvantaged individuals and collectives, climate change, feminism and many social issues have become the focus of trauma studies. Researchers and critics have addressed many issues outside the boundaries of psychology and psychoanalysis within the framework of trauma. Literature was one of these areas. According to literary critics and researchers in particular, literature had the ability to remove traumatic events from their real context and represent them in fiction; it could create tolerance and empathy, use the healing power of narrative, and transform writing and reading into a healing tool. It could grant the right to speak to people who were marginalized and whose voices were silenced. This study aims to examine the healing of trauma in Bextiyar Eli's novels *Hinara Dawî ya Dinyayê, Qesra Balîndeyên Xemgîn, Êvara Perwaneyê, Bajarê Mosîqarê Spî û Apê Min Cemşîdxan Ku Hertim Bê Li Ber Xwe Dibir* within the framework of trauma studies. This study examines the ways of healing trauma in these novels, and also questions what kind of a mission the novels undertake in terms of healing a people's traumas. We concluded that Eli's characters never have the opportunity to heal through therapeutic or psychiatric treatment methods; they can heal through travel, friendship, mourning and writing.

### Keywords

Trauma, healing, Bextiyar Eli, journey, friendship, mourning, writing.

### Destpêk

Teorîya trawmayê bi qasî ku giringî dide cûre, sebeb, semptom û encamên trawmayan ew qas jî giringî dide çareyên pakbûnê yên trawmayan. Metodên terapotik û psîkanalîtik, rîtuelên çandî, bawerî û taetên dînî, rîwîtî, hogirtî, şîngirêdan, bêdengî yan nivîsîn; divê rîyek hebe ku trawma bi saya temsîlê xwe bide der û dîza sebrê neşikê. Ger mirî nikaribin biaxîvin; medxûr û saxmayî jî lal bin kî yê trawmayê vegê-re? J. Roger Kurtz dibêje peyva "trawma"yê ji bûyerên trajîk û felaketên mezin bigire heta bûyerên rojane, ji bo her êşê tê bi kar anîn, PTSD (Post Trumatic Stress Disorder / Nêxweşîya Stresê ya Piştî Trawmayê) her ku diçe zêdetir xwe dide der; çunkî em di serdemêke trawmatîk da dijîn. Têgeha trawmayê ji bo analîzkirina meseleyên civakî çiqas rikinê bingehîn be êdî ji bo tehlîla metna edebî jî rikinê bingehîn e. (Kurtz,

2018, r.1). Li gorî Judith Herman trawma zirar dide tecrûbeyên bingehîn ên însanan û wan sînordar dike, têkilîyêñ însanan qut dike. Ji ber vê yekê jî divê têkilî ji nû ve bêñ avakirin. Şîfaya herî mezin xurtkirina wan însanan e, bi saya pêwendîyêñ nû mimkun e însan pak bibin. "Ji nû ve xwedî pêbawerî, xweserî, însiyatîv, têrêkirin, nasname û dilgermîyê bin." (Herman, 2015, r.133). Herman dibêje pakbûn di sê qonaxan da pêk tê. Di qonaxa ewil da ewlehî ji nû ve tê avakirin; di qonaxa duym da bibîranîn û şîn pêk tê, di ya sêyem da jî kesê trawmatîzebûyî ji nû ve ji jîyanê hez dike, tehm jê hil-dide. (2015, r.155). Herman vegêrana mexdûr yan saxmayîyan wekî jinûveavakirinê hildisengîne û bi saya vegêranê saxmayî çîroka xwe ya trawmatîk vediguherîne û entegreyî çîroka xwe ya jîyanê dike. Dibêje "hafizaya trawmatîk lal û statîk e." (2015, r. 175). Loma jî divê hin çareserî hebin ku saxmayî çîroka xwe vegêre û çîroka xwe ya trawmayê ji nû ve ava bike. Di van pêvajoyan da şîngirêdan jî bi qasî axivînê muhîm e. Dibe ku saxmayî ne bi tenê ji ber tirsê, ji serbilindîyê jî şîn girê nede, ev bertek bi awayekî seknek e li hemberî faîlan; lê belê dawîya dawî ew dilgiranî xisarê dide saxmayîyan. Herman şîngirêdanê wekî çalakîyeke wêrektîyê hildisengîne û dibêje ku "Bi tenê bi saya şînê saxmayî dikare tiştê ku winda kiriye û hestêن xwe yêن têkçûyî kifş bike." (2015, r. 188). Herman tesbîten xwe ji bo tedawîyêñ terapotîk pêşnîyaz dike. Lê belê bi taybetî teorîsyenêñ postkolonyal di wê fikrê da ne ku tedawîyêñ terapotîk ji bo gelên bindest, kom û şexsêñ xwedî dezawantaj pirî caran ne mimkun in ku teorîya trawmayê ya postkolonyal jî bal kişandiye ser vê meseleyê. Aimé Césaire, Frantz Fanon û Achille Mbembe di nav zanyarêñ postkolonyal da ne ku balê dikişînin li ser kolonîyê wekî cîhekî trawmayê û modernîteyê. Bandorêñ modernîteyê ketine nav rûtînêñ jîyana rojane, domdar in; loma jî kîmasîya modela li ser bûyeran derketiye holê. Achille Mbembe kolonyalîzmê wekî "hydra-headed/ marekî du/ pir serî" dinirxîne û dîbêje "postkolonî ji gelek bêdewamîyêñ lihevxitî, bêserûberî, bêhêzî, vehejînan û gelek ji durée /wextan pêk tê ku hevdu pêçane. (Mbembe, 2001, r. 14). Qesta Mbembe û gelek rexnegirêñ postkolonyal ew e ku, bertekeke postkolonyal ew qas hêsan nîne. Famkirina trawmaya mexdûrêñ "neRojavayî" ancax bi helwesteke gerdûnî ra mimkun e. Stef Craps rexnegirekî dijkolonyal e, teorîyêñ trawmayê yêñ damezrîner daye ber rexnayan û wî lêkolîner û rexnegirêñ Rojavayî bi bêsamîmîyetî wesifandine. Dibêje:

Balkêş e ku metnêñ damezrîner ên qadê (di nav da xebata Caruth bi xwe jî) ehdêñ xwe yêñ tevlêbûna exlaqî ya navçandî bi cî neanîn. Herî kêm di çar xalan da têkçûn. Trawmayêñ neRojavayîyan yan marjînelîze kirin yan jî guh nedan trawmayêñ wan. Ew meyl dikan ku bê pirs rastbûna gerdûnî ya pênaseyêñ trawmayê û pakbûnê qebûl bikin ku li derveyî çandêñ kêmîneyan hatine sazkirin. Di dîroka modernîteya Rojavayî da gelek caran estetîka modernîst ya parçebûyî û aporia ji bo şahidiya trawmayê wekî rîyêñ tekane hatine dîtin û wan bi giştî guh nedan têkilîya di navbera metropolîtan û trawmayêñ neRojavayî û kêmîneyan. (Craps, 2013, r. 2).

Hem teorîya klasîk hem jî yêñ postkolonyal herî zêde qîmetê didin vegêranê û şîngirêdanê. Teorîya trawmayê ya postkolonyal ji bo ramaneke dîrokî û celibînî, der-

fetekê pêşkêş dike; ew di vegêranê da derfet dide yên ku hatine înkarkirin. Bi vê derfetê ra, vegêrana alternatif, li hember vegêranên kolonyal ên serdest û li hember bêdengkirinê radibin. Ew bandora katartîk ya vegotinê ji sînor û pênaseyên teorîya trawmaya Rojavanavendî derdixe û bi vegêranên herêmî berfireh dike. Fîksiyona romanên postkolonyal nîşan didin ku trawma dikare bi tevahî were vegêrandin û dîsa nîşan didin ku çîrokbêjîya devkî rê dide ku kûrbînî, razîbûn, bidestxistina telaffiyên cûrbicûr ên pakbûnê mimkun be. Çîrokbêjî rîtueleke qedîm e û dikare trawmayan aş bike. Di heman demê da ji ber ku di navbera nifşan da pêwendîya hestyarîyê ava dike, hesta windabûnê jî derman dike. Erin O'Connor dibêje: "Windakirina wêraker ya çand, rîtuel û bawerîyê bûye yek ji mijûlîyên sereke yên nivîsên postkolonyal. (O'Connor, 2003, r. 227). Nigel C. Hunt behsa qîmeta nivîs û çîrokbêjîyê dike, bê ka çawa dikare alîkarîya însanan bikin ku însan bikaribin serederî bi trawmayên xwe ra bikin. Dibêje: "Ji bo gelek însanan rîyeke karîger e, ku bikaribin bîranînên xwe yên trawmatîk aş bikin." (Hunt, 2010, r. 161). Manevîyat dikare berxwedanê xûrt bike, pevrebûnê bi pêş bixe, hêvîyê têkçûyî ji nû ve ava bike û pêşîya PTSDyê bigre. Li gel ku gelek nîşanên trawmayê gerdûnî ne, bersivên li ser trawmayê û rîbazên rûbirûbûn û başkirina trawmayê cuda ne. Ji ber ku dînamîkên sereke yên ku van cu-dahîyan dîyar dikin, pêwendî û kontekstên çandî ne, lêkolînên di vî warî da di salên dawî da li lêkolînên trawmayê zêde bûne. Têkilîyên çandî, ku niha bûne qebûleke fermî, di rapora DSM-IVê ya Komeleya Psîkîyatrîk ya Amerîkî da jî bi fermî hate nas-kirin. Di vê raporê da 'Ferhenga Sendromên ku bi Çandê ra Têkildar in' hat amadekirin. (DSM-IV, 2002, r. 897-905). Zêdetir bal kişandin li ser normên referansa çandî, ew norm destnîşankirin, ku di başkirina nexweşîyê da roleke muhîm hildigirin. Van nerînan kir ku eleqeya li ser edebîyatâ civakên neRojava jî zêde bin. Li gorî Irene Visser edebîyatêne Rojavayî, bi rastî, wekî ku rexnegiran destnîşan kirine, pirî caran dermankirina trawmayê bi awayên xwemalî ifade dikin. Visser dibêje: "Ez idia dikim ku di rûbirûbûna trawmayê da, divê em ji pergalên bawerîyê yên neRojavayî, rîtuel û merasîmên wan sûd werbigirin." (Visser, 2015). Wek nimûne, zanyarên ku bi gelên Maorî ra xebitîne, piştrast kirine ku di edebîyatê da entegrasyon û girêdana piştî trawmayê, bi rîya çîrokbêjîyê va, wekî kevneşopîyeke çandî ya sereke hatiye bikaranîn. (Keown 2007, Knudsen 2004, Visser 2012). 'Waitangi Tribunal in New Zealand Aotearoa (Dadgeha Waitangi li Zelanda Nû li Aotearoayê)' biryar daye ku bikaranîna zimanê xwecihî di pakbûna trawmayan da xwedî roleke muhîm e. (Visser, 2018, r. 128). Bi lêkolîna metnîn antîkolonyal ra rexnegiran hewl daye ku ew teza ku dibêje melankolî encama neçarıya trawmayê ye, wê tezê pûç bikin. Mimkun e ku edebîyatêne Rojavayî baqeke berxwedanê pêşkêş bikin; ji ber ku pirî caran trawma dibe sebeba berxwedana wan, ne ku têkçûna wan. Her çend ev cihêrengî ji alîyê teorîya trawmaya klasik ve hatibe paşguhkîrin jî, berhemîn edebî yên postkolonyal û antîkolonyal delîlên vê yekê ne. Suzan Y. Najita ew fikra ku dîbêje, trawma milettekî seqet dike yan jî qels dike, li hember wê fîkrê radibe; li gorî wê, ji ber trawmaya kolonyal hêvî dînamîka bingehîn e li şûna melankolî û şînê. Nemaze bi dayîna mînakên

lêkolînên xwe yên li ser herêmâ Pasîfîkê, vê yekê piştrast dike. Najita dîyar dike ku wêjeya Okyanûsyayê ji bo vejandina kevneşopîya devkî û têkoşîna ji bo dekolonîzasyonê alîkarek e. Dibêje: "Vejîna kevneşopîya devkî û têkilîya wê bi berxwedana dijkolonal ra heye. Ew ne çîrokên şîna neteweyî ne, belkî xebata sîyasî berdewam dike. Bi qewirandina rabirdûyê ra xeyala siberojê geş dikin." (Najita, 2006, r. 25). Gerald Vizenor vê yekê ji bo trawmaya çermsoran tîne zimên. Li gorî wî trawmaya wan xweserî xwe ye. Bi saya çîrokbêjî û ziman sax mane û divê rîbazên wan bêñ nasîn. Saxmayîna wan û têkoşîna wan kiriye ku têgehêñ herêmkî yên wekî "post-indian" û "storying" bêñ afirandin. Vizenor dibêje:

Saxmayîna nîştecîyan li hemberî tunebûn, qiranîn û jibîrkirinê hesteke çalak ya hebûnê ye; saxmayîn berdewamîya çîrokan e, her çend wisa bê qebûlkirin jî ne bi tenê berteket e. Çîrokêñ saxmayînê, jêgerîna ji serdestî, piçûkxistin, zordestî, hestêñ trajedîyê yên ku xîreta wan qebûl nake û mîrateya mexdûrîyetê ne. Saxmayîn, mîrasgirtina mîrasekê ye yan heqê vegerandinê yê halê berê ye. (Vizenor, 2008, r.1).

Deborah L. Madsen jî piştgirî dide Vizonerî. Fîgura postindian (çermsor), berxwedan û saxmayînê, ji trajedîyê wêdetir saxmayîna xwecîyan, sîmulasyonê xwecîhî yên Amerîkî temsîl dike ku, dibe ku di çanda serdestîyê da mexdûrbûn û dermankirina derewîn temsîl bikin. (Madsen, 2008, r. 68).

Primo Levi, Elie Wiesel, Anne Frank, Victor Frakl û Charlotte Delbo di edebîyata Holokoustê da bûne kesayetên herî naskirî. Piştî ku saxmayîyen Holokoustê axivîn û rastîya Holokoustê eşkere bû; bi sedan temsîlîn Holokoustê pêk hatin. Hem bi xebatêñ sîyasî hem bi temsîlîn hunerî ra haya hemû dînyayê ji Holokoustê çêbû. J. M. Coetzee, Nadine Gordimer, Andre Brink, Bessie Head, Achmat Dangor û Zakes Mda nivîskarêñ Afrîkaya Başûr in ku li ser Apartheid diaxivin. Gelêñ kolonîzebûyî yên ku ziman û vegotina wan ji destêñ wan hildane, ne bi tenê bi trawmayê ra rûbirû ma-bûn, di heman demê da neçar bûn ku ji bo vegêrana trawmaya xwe zimanekî peyda bikin. Nivîskar bi vegêrana trawmayê ra bêdengîyê red dike, li trawmaya xwe xwedî derdikeve; ger karakterên xwe jî bide axivtin du qatî bêdengîyê red dike. Bi saya vegêranê, ew fikra ku dibêje "trawma nayê vegêrandin" li hember wê fikrê radibe. Nimûneyên vegêrana trawmayê, bi tenê behsa şîdetâ trawmatîk nakin di heman demê da ew jîyana ku di nav şîdetê da dikude, behsa wê jîyanê jî dikin. Nivîskar bi vegêrana trawmayê ra behsa çareserîyên serederîpêkirinê jî dikin.

Di romanên Bextiyar Elî da yên bi navê *Hinara Dawîya Dinyayê, Qesra Balîndeyên Xemgîn, Èvara Perwaneyê, Bajarê Mosîqarêñ Spî û Apê Min Cemşîdxan Ku Hertim Bê Li Ber Xwe Dibir*, em dibînin ku hem trawmayê şexsî hem jî yên kolektif tu caran bi saya pisporek yan bijîşkekî pak nabin. Wekî ku rexnegirîn postkolonal destnîşan dikin, rîbazên terapotîk û psîkyatrîk mimkun xuya nakin. Şexs û civak di çarçoveya dînamîkên xwe da çareserîyan peyda dikin, birînêñ hev derman dikin û ku tu çareserî peyda nekin jî bi awayekî mecbûr li gel trawmayêñ xwe dijîn. Di van romanand da rîyêñ herî berbiçav ên pakbûnê rîwîtî, hogirtî, şîngirêdan û nivîsandin in. Li gel ku

rêwîtî, hogirtî, şîngirêdan û nivîsîn ji bo karakterên romanan rîyêne sereke yên pak-bûnê ne, rola ku roman rasterast hildigirin rola çîrokbêjîyê ye. Elî di van romanan da bi saya vegêranê, edebiyatê, çîrokbêjîyê trawmayê Kurdan temsîl dike. Trawmayên kerr, trawmayên şexsî û kolektîf, trawmayên navnifşî, trawmayên ku sebeba wan kolonyalîzm, şer, şerê navxweyî, zayenda civakî û dîn in di van romanan da ji gelek hêlan ve hatine temsîlkirin. Ev roman di pêvajoyê kolonyal da û piştî kolonyalîzmê çi hatiye serê gelekî, meşrûkirina tecrûbeyên herêmî yên gelê Kurd, pirsgirêkên nas-nameyî û şêwazên berxwedanê didin nasîn ku rola sereke ya romanê postkolonyal û romanê trawmayê ev in. Ji ber van taybetîyan em dikarin romanê Bextiyar Elî yên navhatî hem di kategorîya ‘edebîyata trawmayê/ romanê trawmayê’ da hem jî di kategorîya ‘romanê postkolonyal’ da hilsengînin.

## 1. Rêwîtî

Rêwîtî, di romanê navhatî da pirî caran mecbûriyetek be jî di axirîyê da gelek tecrûbeyan li jîyana karakteran zêde dike. Di wan rêwîtîyan da reva ji trawmayê bi demê ra dewsa xwe dide kemilînê, haya karakteran jê çênebe jî bi demê ra trawmayên wan aş dibin û bi awayekî pak dibin. Cemşîd xan bi îradeya xwe nafire, her carê berê wî dikeve herêm û welatên dîtir lê rêwîtîya herî muhîm di dawîya romanê da derdikeye pêşberî me. Cemşîd piştî sal û wextan ne pak dibe ne jî qelew dibe, serpêhatîyê wî ji dubarebûnê wêdetir tu tişt nînin. Di dawîyê da hemû hîkayeta wî bi saya tattoyê li ser laşî wî neqş dîkin û piştra diçe. Êdî biçe ku yê çîroka xwe jî bi xwe ra bibe.

Rêwîtîyeke muhîm jî di dawîya Hinara Dawî ya Dinyayê da heye. Muzeferê Subhdem piştî bîst û yet salan ji girtîgehê derdikeye lê belê hemû mirazîn wî di çavên wî da dimînin. Xeyala wî ya herî mezin ew bûye ku rojekê xwe bigihîne kurê xwe. Lê piştî ku derdikeye dibîne ku dinya devevdev tije trajedî û trawma ye. Hin kesan (polisan) Seryasê Subhdem /Yekem kuştine, yê Duyem di hepsê da ye, yê Sîyem nivîşkanî maye. Rûyê yekî jî nabîne. Di dawîya romanê da ew jî li keştiyekê sîwar dibe û dixwaze li pey Seryasê Sîyem biçe Îngilistanê; lê deh roj in di nav behrê da winda ne. Her çend di behrê da winda be jî bi saya wê rêwîtîyê behsa çîroka xwe dike, em bi saya wê rêwîtîyê hemû çîroka wî û yên Seryasan, ya Xwîşkê Spî, ya Mihemedê Dilşûşe û yên din hîn dibin. Rêwîtî dike ku ji mekanên trawmatîk dûr bikeve û bi awayekî bikaribe çîroka xwe vegêrîne. Muzeferê Subhdem aram xuya dike, hemû trajedî û trawmayê wî bi wê rêwîtîyê ra kuta dibin. Muzefer dixwaze çîroka xwe bi guhdaran/ xwîneran bide ezberkirin. Muzeferê Subhdem trawmaya çîroka xwe, li gel çîroka xwe şahidîya gelek çîrokên trawmatîk dike û di dawîyê da dengê wan însanan digihîne xwîneran. Di dawîyê da bimire jî dê xemgîn nebe, çunkî çîroka êndin vegêrand.

Ez piştrast im eger di vir de bimirim jî, dê tiştek vedenga min bibe dûr. Dê tiştek dengê min tev li dengan bike. Dê tiştek vê çîroka min ber bi paş okyanosan ve bibe. Tiştek, mirovek, awazek ku taliya talîyek tê û kodêن wê dixwîne û digihîne êndin... (HDD. r. 345).

Di Bajarê Mosîqarê Spî da gelek rêuwîtî hene ku her carî rola terapîyê pêk tînin. Celadet her cara ku diçe Bajarê Mosîqarê Spî di vegerê da bêtir kemilî ye, bêtir aram e. Heman aramî piştî rêuwîtîyê ber bi Okyanosa Hawarê jî pêk tê. Qîmeta rêuwîtîyê di hevokêن Îshaqê Lîvzerîn da veşartî ye. Ew çaxêن ku Îshaq herdu xwendekarêن xwe hînî mosîqayê dike bi wan ra dest bi rêuwîtîyê dike, Îshaq ji wan ra behsa sê cure rêuwîtîyê dike.

Wî got ku mirov li pêşberî sê rêuwîtiyêن mezin e, rêuwîtiyek bo nav xwezayê, rêuwîtiyek ber bi asîman û rêuwîtiyek bo nav hundirê xwe. Mirov bo ku bibe mirov, divê yek ji wan rêyan bigire pêşîya xwe. Îshaq digot: "Di van rêuwîtiyan de mirov bi tenê ye, ti kes nikare alîkariyeke giring digel kesekî din bike, dema ku mirov diçe nav xwe, dema ku diçe nav xwezayê, dema ku ber bi aliyê Xweda ve diçe, bi tenê ye. (BMS, r. 29).

Di Qesra Balinneyêن Xemgîn da jî rêuwîtî xwedî giringîyê ye. Sewsen xanim hersê xwezgînîyêن xwe dişîne rêuwîtiyekê ku ev rêuwîtî heyşt salan dikude. Yê dinyayê nas bikin, yê balindeyan nas bikin, yê bikemilin û ya herî muhîm yêni ji mekanên trawmayê dûr bimînin. Di vegera hersê xortan da em dibînin ku bi rastî jî bandoreke erêni li ser du xortan çêbûye. Berî ku biçin rêuwîtîyê Kameran ji bo eşqa xwe Mensûr dabû ber kérê. Piştî vedigere Sewsen jê dipirse, gelo mimkun e careke din tiştekî wereng bike. Kameran behsa poşmanîya xwe dike. Kameran di rêuwîtiya xwe da hîn bûye, jîyana balindeyan zehf biqîmet e û piştî ku tu hînî vê yekê dibî êdî tu carî nikarî zirar bidî însanan. Kameran kemiliye. Sewsen çavêن xwe digire û ji desten wî dest pê dike û hemû bedena wî bêhn dike, dawîyê da diheyire. Bedena Kameranî bêhna dinya û jîyanê dide. (QBX, r. 279). Ya muhîm, Kameran berî rêuwîtiya xwe tolazek e, lê rêuwîtî ew kemilandiye, trawmayêن wî pak kirine. Heman tişt ji bo Mensûr jî li dar e. Mensûr ne li pey tolhildanê ye ne jî li pey eşqê ye. Hê jî ji Sewsenê hez dike lê belê rêuwîtîyê ew, ew qas guhirandiye ku êdî ne mimkun e li wan mekanên trawmayê bijî, dê heta hetayê biçe û careke din venegere. Ew jî têra xwe kemiliye. Yê ku rêuwîtî tu bandoreke erêni lê nekiriye Xalid Amûn e, jixwe trajedyêن rojên bê li ser vê esasê ava dibin. Tolhildan, birakuji, mirin, trawma pêşîra wan bernade.

## 2. Hogirtî

Di hilsengandina romanêن trawmayê da, çarçove û hûrgilîyêن trawmayêن takekesî û her weha çarçoveyêن kolektif cîh digirin. Rexnegir bi giştî didin li pey bersivê van pirsan. Bûyera ku (şer, şerê navxweyî, şîdetâ nav malê, destavêtin, lêdan û hwd.) di navenda vegêranê da ci ye? Piştî ku atmosfer diguhire karakter dikevin nav tevgerên çawa? Bûyera ku dibe sebeba şikestina trawmatîk, li ser hemû kolektifê heman bandorê dihêle? Têkilîya şexsan bi civak û neteweyê ra di ci astê da ye, şexs ji wan çawa bandor digirin? Di têkilîyêن şexsî da, mirov ji bo hev roleke çawa hildigirin? Nick Bentley ji bo ew kesên ku trawmaya mexdûr yan saxmayîyan guhdar dikan, têgeha "informal psychoanalyst, surrogate psychoanalyst / psîkanalîstê cîgir" (Bentley, 201, r. 28-29) bi kar tîne. Wekî dayika cîgir, bavê cîgir, birayê cîgir... hwd. Gelo kî vê

rolê hildigire/ hildigirin? Trawmayên ku bi nasnameyên kolektîf ve girêdayî ne, di çîroka kesan da bi ci awayî hatine bicîkirin? Qîmeta vegêranê û fonksiyona vegêranê ci ye? Romanên postkolonyal çendî ku behsa têkçûyîn, êş, windakirinan bikin jî; behsa pakbûnê, berxwedanê, jîyanek gulvedayî jî dikan. Rabirdûya trawmatîk ya şîdetâ civakî, pergala ku hewl dide bikerê bêdeng bike, zexta hegemonîk, bandorênen şeran, şêwazên berxwedanê yên li dijî vê zilmê; rîwîtya pakbûnê di romanên trawmayê da mimkun e were temsîlkirin. Di vê rîwîtya pakbûnê da rola hogirtîyê gelek muhîm e. Hogir di heman demê da psîkanalîstên cigîr in.

Karin Mlodoch (2014) ji bo pakbûnê çend pêşnîyazan dike. Xêncî qewîniya şexsan, ewlehîya fîzîkî û aborîyê, torêن cîvakî yên biştîkrar, guhdarêن empatîk û mirovîn havirdorê yên ku mirov bawerîya xwe bi wan tîne, ev faktor dikarin pakbûnê pêş ve bibin. Li gel van faktoran, faktoreke din jî heye ku dikare hêzê bide mexdûran. Ew jî qebûl e. Ew şîdetâ ku pêk hatiye, heke ji alîyê hêzên sîyasî û cîvakî ve neyê tepisan-din, berevajî bê qebûlkirin; tevkarî li serederîpêkirina mexdûr dike. (Mlodoch, 2014, r. 43). Mlodoch behsa jinêن Enfalê û trawmayên wan dike. Ew jinêن ku navê “bewa-jin-î Enfal” (2014, r. 425) li wan kirine, piştî ew qas trawmayan bi saya kolektîfan rabûne li ser pîyan, tu yekî jî tedawîyeke terapotîk nedîtiye, bes pişta xwe daye hev û kolektîfa xwe. Di nav wê kolektîfê da birînêن xwe pêçane. (2014, r. 496).

Di romanên navhatî da roleke muhîm ya hogirtîyê heye. Ew şertên cîvakî û sîyasî yên ku tu caran derfet nadin ku şexs li der dora malbateke şanaz bicivin, berê însanan dide hogirtîyê. Pirî caran mexdûren heman şertan in. Em dibînin ku di hemû metnan da hogirtî pirî caran yekane derman e ji bo ku bikaribin ji tarîyê derkevin, xwedî hêz bin, birînêن xwe bi hev ra bipêçin. Di Êvara Perwaneyê da Perwane û Mîd-ya li Aşiqistanê hesreta xwe, hêvîyên xwe, tirsên xwe, mirazên xwe, bi hev ra aş di-kin, ew hemû mirazên ku di ber wan da mane. Bi şevan li daristanê derd û kulên xwe ji hev ra dibêjin. Mîdya dixwaze Perwaneyê aş bike, dixwaze hêvîyekê di dilê wê da şîn bike, dibêje: “Xema te ya bive diçe nava pelan, diçe nava hêkên tutiyan, diçe nava rihê şitlan; divê tu ji vê xemgîniyê derkevî.” Lê Perwane ji xeleka van xemên bixof dernakeve.” (EP, r. 205). Heta wê roja ku mecbûr dimînin daristanê biterikînin, her tim li cem hev in, piştevanêن hev in, di dawîya çîroka xwe da jî bi hev ra ne. Bi hev ra têن kuştin û bi hev ra têن çalkirin. Piştî ku ew ji mal direvin herdû xwîşkêن wan yên piçûk berdela gunehêن wan didin û li dibistaneke dînî têن perwerdekirin. Pitsî ku Perwane direve, meta Perwane û Xendarê ku rîbereke jinêن dîndar e, ji wê revê û koçberîyê pir aciz dibe, li gorî wê ew keçik koçî welatêن gunehkaran dikan. Di vê navê da birayê xwe jî şîret dike ku ji Xendarê ra çarenûsekê peyda bike. Xwîner li vir hay jê dibe ku Xendar ji çardeh salî nû borîye. (EP, r. 134). Esreke hênik bavê wê, wê teslîmê jinêن tobekar dike. Ew merasîm bi tamamî bi tirsê, bi endîşeyê hatiye şaye-sandin. Xendar wekî ku li meydana şer be, şerê ku metê xwe jê ra amade kiriye. Bi dehan keçikêن piçûk ên mîna Xendarê li wir in û bavêن mîna bavê wê li wê merasîmê keçen xwe teslîmê metê dikan. Met xwedî dezgeh e, met xwedî iqtîdar e. Xendar bes

ditirse. (EP, r. 136-137). Xendan û ew keçên din kêtfaretê didin; lê belê ne ji ber kirin yan sûcekî xwe. Melayê ku merasîmê bi rê ve dibe, hemû sûcên dinyayê dide hev û ew şev dixe stûyê wan bavan û keçan. Xendan wê şevê Fetaneyâ Xemgîn nas dike. Xendana Piçûçik û Fetaneyâ Xemgîn piştî wê şevê di dibistaneke leyîmecanî da bi cî dikan û li wê dibistanê di bin zilma Zeyneba Kwêstanî da ew qas têr eciqandin ku; ji bo ku aqilê xwe nexwin mil didin hev, çirokan vedigérin, kitêban dixwînin, bi şev û rojan sohbet dikan.

Nesredînê Bêhnxweş, Ferîdunê Melek û Govend berî ku berê xwe bidin Aşiqis-tanê bi rojan hêvî û xeyalên xwe parve dikan, Nesredîn dibêje: "Bajar bi eşqên bê-miraz û nîvcomayî dagirtî bû." (EP, r. 77). Govend jî xordekî din e ku ew jî ji vê dest-hilatdarîyê aciz e. Li bajêr bi tenê mekanek tuneye ku keç û xort lê rûnên û hev nas bikin, çend gotinan bi hev ra bikin. Ferîdunê Melek demeke dirêj bi tenê jîyaye, ji dehsalîya xwe ve weke zarokekî tenê û bêkes di maleke vala da xwe bi xwe mezin kiriye. Piştî mirina dê û bavê wî, ew ji destê apêx xwe reviyaye û vege riwaye wî xanîyê ku dikeve kûçeyeke kevn û girtî ya bajêr, wî çaxî her çiqasî temenê wî deh sal be jî, qilafetê wî yê ciwanekî panzdeh salî bûye. Çiroka her yekî ji ya/yê din stuxwartir e. Ferîdun zemanekî kîrbaz bûye. Ferîdun dixwaze biçe cîyên dûr. Dîxwaze ji wî bajarî biçe. Govend jî dixwaze. Nesredîn, Ferîdun û Govend dibin hevalên nêz û pirî caran digihîn hev û bi hev ra radibin û rûdinê. Pirî caran Ferîdun li hember wan rûdinê û napeyive, ger bipeyive jî behsa bajar û welatên fantastik yên di nav xeyala xwe da dike. "Çend û çend salan ew studio bû cihê jîyan, vexwarin û hevdîtina wan hersê mirovên ku hergav piştî gera xwe ya rojane vedigeriyan wir." (EP, r. 89). Mîdfa ji bo Perwaneyê, Xendan û Fetane ji bo hev psîkanalîstên cîgir in, ew jî nebin yê nikaribin bi tu awayî serederî bi trawmayê xwe ra bikin.

Di Qesra Balindeyê Xemgîn da jî hogirtî ji bo aşkirina trawmayan têkilîyeke muhîm e. Kameranê Selma xortekî kîrbaz û hêrsok e, çendî ku tiştên baş fêrî wî neke jî Mengurê Babagewre ji bo wî hogirekî hemû dem û dewranan e. Ji bo Kameranê Selma bextewar be ci ji destê Mengur were, ji Kameran texsîr nake. Piştî ku Sewsen ji xwazgînîyê xwe dixwaze ku biçin sefereke dûr û dirêj; Mengur, Kameran finanse dike, bi salan bi saya nameyan tu caran têkilîya xwe pê ra qut nake, di dawîya seferê da gava Kameran vedigere welêt, ji bo wî piştevanê herî muhîm dîsa Mengur e. Ew mala ku piştî zewacê Sewsen û Kameran û balinde lê bi cî dîbin, ji alîyê Mengur ve tê kirîn. Ev piştevanî çima muhîm e, ji ber ku saya vê piştevanîyê Kameran dikare ji mekanên trawmatîk dûr bikeve, piştî sefera xwe biguhere û wekî xortekî kamiltir vegere welêt. Di wan hemû salan da ku şerê kolonyal û navxweyî tu caran pêşîra wan bernade, ji bo Sewsenê bavê wê Fîkret Guldançî û xwîşka wê Piroşe piştevanên herî muhîm in. Her ci bixwaze, kîngê xwe lawaz hîs bike her tim li ber serê wê ne; lê belê ji bo Sewsenê hogirek heye ku di nav bîst salan da haya kesî ji hebûna wî çenabe. Aryan Cewdet nêzikî bîst salan ji bo Sewsenê resman dineqîşîne, di wê malê da wekî xeyaletekî ye. Her kes dizane ku aşiqê Sewsenê ye; lê tu caran soza xwe binpê nake û hestêن xwe nade der. Bi rojan û saetan resman çêdike, gava cî namîne cîyekî bi bo-

yaxa spî boyax dike û resmeke nû dineqîşîne. Dîwar di nav van salan da rewşeke palimpsest werdigirin. Palimpesta resman, palimpesta êş û trawmayan, palimpesta têkçûyîn û hêvîyan li dar e; çunkî şer naqede.

Gava ku di sala 2004an de, şer li Iraqê şêweyeke din wergirt, Sewsen bi berdewamî ji wêneyên teqîn û laşen şewitî yên li ser cadeyan direviya û di wêneyên Aryan de noq dibû. Bi berdewamî ji xwe dipirsî dê kengî sîbera mirinê bigîhe vî şarî. Di wê demê de, tenê ew yek di xeyala wê de hebû ku Huzar ji cengê vêga û sibê rizgar bike. (QBX, r. 404).

Aryan Cewdet di nav wan salan da bi resmên xwe Sewsenê aş dike, terapîyeke muhîm pêşkeşî Sewsenê dike. Ji bo Sewsenê bavê wê, xwîşka wê, Aryan Cewdet û ya herî muhîm 'balinde', psîkanalîstê cîgir in. Piştî gelek karesatan di dawîya romanê da Elî çend kesan tîne ba hev ku rasterast amaje li giringîya hogirtîyê dike. Di bihara sala 2003yan da gava ku Sedam Huseyn têk diçe Sewsen gelekî kîfxweş dibe (QBX, r. 398), lê dawîya salê wekî ku rojêن xirabtir li ber derî bin û balinneyên xanimê ji ew yek hîs kiribin yek bi yek dimirin. "Di sala 2006an de, rojekê Mengur vege riya şar... por û riheke spî berdabû, pir ji berê lawaztir bû." (QBX, r.399). Vegêr dibêje: "... wî ji me re got ku ew hatiye da ku li vir bimire." (QBX, r. 400). Roja duyan diçe qesrê. Sewsen wî efû dike û dibe hundirê malê. Guldançî, Saqî Mehmud û Mengur. Sê kalemêr, sê tecrûbeyên dûrûdirêj. Jineke jinebî, nûciwanek (kurê Piroşeyê). Ew kî ne ku nivîskar di dawîya romanê da di malekê da wan dicivîne û bi awayekî aştîyane bi hev ra dijîn? Bûyeran bi rengekî hemû daye ber diranên xwe û hêrane, ji kînên xwe, şikestinêن xwe hatine xwarê, xwe li hogirtîyê girtine...

...bêhêvîtiyên jiyana wan bi cûrekî gewre bûn ku divabû di çavêن hev de li hinek hêvî bigerin... gava ku Saqî û Mengur hev hembêz kirin, li cem Fîkret Guldançî hembêzkirina wan li lihevhatina du mirovîn zindî nedîçû, bi qasî ku li lihevhatina du terman diçû. Piştî çend rojan gava ku her sê bi hev re li ser taşte rûniştin, Fîkret bi ken ji wan re got, "Yê ku em kirin dost, nêzîkbûna mirinê ye. (QBX, r. 401).

Di romana Hinara Dawî ya Dinyayê da tu kes nîne ku trawmayên giran nejîyabe. Seryasê Yekem, Seryasê Duyem, Seryasê Dawîn, Muzeferê Subhdem, Mihemedê Dilşûse, Nedîmê Şahzade, Îkramê Kêw û Xwîşkên Spî hemû jî însanên baskşikestî ne. Ya muhîm ew e ku bes hevaltî û hogirtî di wan rojêن tarî da digihîje hawara wan. Seryasê Yekem, Seryasê Duyem, Mihemedê Dilşûse û Nedîmê Şehzade gava diçin bin hinara dawî ya dinyayê, li wê lûtkeyê ji mekanêن trawmatîk dûr dikevin; di heman demê da bi saya hogirtîyê ji bo demekê be jî birînêن xwe dipêçin. Behsa zaroktîya xwe, behsa hêvîyên xwe, behsa şikestinêن xwe dikin. Ji bo hev dibin sitar. Mihemedê Dilşûse dibêje:

Ji ber ku mirov li vir hest dike ku mumkin e jiyan bi awayekî din be. Hinara dawîn ew dar e ku ji min re dibêje mumkin e jiyan bi awayekî din be, mumkin e em di dinyayeke ronak û saf û bêguneh de bijîn. Ev dar tiştek e ku îlhamê dide me. Îlham û hew... Dara biratîya me. (HDD, r. 236).

Hewcetîya wan bi biratîyê, hewcetîya wan bi hogirtîyê heye. Ne Mihemedê Dilşûşê lê hersê xortê din sêwî û êtîm in. Nebûna malbatekê berê wan dide hevdu, ji bo demekê dibin gumana hev. Şer, mirin, koçberî hemû jîyan dorpêç kiriye, di wan şert û mercan da bes hogirtî wan aş dike. Ew jî ji bo hev psîkanalîstêni cigîr in. Heman rewş ji bo Muzeferê Subhdem jî li dar e. Piştî bîst û yek salan gava ji girtîgehê derdikeve û dixwaze Seryasê Subhdem bibîne li ser dinê kesekî wî nîne, di wê navê da Xwedê li rûyê wî dikene û Îkramê Kêw derdixe pêşîya wî. Îkramê Kêw mirovekî qenc e, Muzeferê Subhdem ji bo wî dibêje: "Ew ji wan kesan e ku da tu hemû bedewîya wan bibînî, diviyabû tu hertim bi wan re bî... Bêhêvîtya wî ya mezin ji însen rê li ber negirtibû ew bi xwe heta dawî mirov be." (HD, r. 267). Îkramê Kêw derbarê Seryasan da agahîyan bi destê dixe, Muzefer û Xwîşkêni Spî bi hev dide naşîn, wan li gundekî li malekê bi cî dike. Qencîyên wî ne bi tenê ev in, hin caran winda dibe û Muzeferê Subhdem bêrîya wî dike, gava jê dipirse gelo ew li ku bûye. Îkramê Kêw behsa serpêhatîyên xwe yên qencîyê dike.

Welat tije kesen belengaz e, ku tenê nikarin êş, derd û birînên xwe derman bikin. Na tiştek ji destê min nayê, lê hest dikim divê herim û bi gotinekê be jî, bi alîkariyeke sade û piçûk be jî, destê xwe dirêjî mirovîn din bikim. Min efû bike, min bikaribûya hemû derd û mîhneten xwe bikiranî yek mîhnet, ez ê hertim bi te re bûma, hertim. Lê ne mumkin e hemû mîhnet bibin yek mîhnet... ne mumkin e." (HDD, r. 267).

Trawmayeke kolektîf û kerr li dar e; her kes birîndar e, her kes xizan e, her kesî ya hezkirîyeke/î xwe yan xizmeke/î xwe winda kiriye. Ji ber ku di civakên wereng da mekanîzmayen profesyonel ên pakbûnê yên wekî psîkanalîzmê, psîkoterapîyê tune-ne; hin şexs yan sazî van baran hildigirin. Îkramê Kêw ne bi tenê ji bo Muzefer, ji bo dehan, sedan însanan vê trawmaê hildigire. Gava Muzeferê Subhdem biryar dide ku li pey Seryasê Dawîn biçe û êdî xatir ji Îkram dixwaze, Îkram rola xwe cardin bi bîr dixe. "Divê ez li wir bim, li wê daristanê bim û bendewar bim ci teyrekî birîndar li nêzîkî min dilûse da ez wî derman bikim." (HDD, r. 268). Civakên ku bi salan di bin bandora şer da mane, heta mekanîzmayen dewletî saz bin mecbûr dimînin bi mekanîzmayen civakî li ser pîyan bimînin. Îkramê Kêw tesbîten Karin Mlodoch piştrast dike, civakên wereng ançax bi saya mekanîzmayen kolektîf serederî bi trawmayen xwe ra dikan û nisbî be jî pak dibin.

Di nav ew qas salan da her cara ku ba Cemşîd xan dide li ber xwe û dibe, lê her carî bi awayekî dîsa vedigere malê û Salar xan û Smayîl xan ên ku birazîyên wî ne, ji bo wî heman rolê hildigirin. Di esasa xwe da ji hogirtîyê bêtir mecbûrîyet e ya ku Smayîl û Salar dikin; lê belê di nav wan salan da dibin hembextîyên hev. Cemşîd xan piştî her trawmayê bi saya piştevanîya wan radibe li ser pîyan, bi saya keda wan sax dimîne.

Hogirtî di Bajarê Mosîqarêni Spî da jî babeteke bingehîn e. Piştî ku Celadet ji mala birayê xwe tê qewirandin Serheng Qasim û Mamoste Îshaqê Lîvzêrîn nas dike. Wê roja ku Îshaqê Lîvzêrîn li ber dikana gulfiroşekî Celadet dibîne, du havalêni Celadet

li cem in. Her du hevalên wî her ku hewl didin behsa mosîqayê bikin Celadet behsa zivistanê dike. Ji ber ku ew du sal in li ber sermaya zivistanê qefiliye "...wê demê zivistan mijara herî metirsîdar a jiyana Celadet bû ku li ser vê baweriyê bû ku li gel nêzîkbûna bidawîhatina biharê jî, hêsta metirsîya mirina di nav sir û sermayê de her bihêz e." (BMS, r. 25). Îshaqê Lîvzerîn bi xwe jî xwedî trawmayan e, lê dîsa jî hewl dide ku herdu xortan perwerde bike û mosîqaya heqîqî hînî wan bike. Herdu xortan dibe mala xwe. Piştî sê hefteyan cara ewil diçin bajarokekî. Bajarokekî ku bi her halê xwe di bin bandora şer da. "...piraniya mîhvanên wî bajarokî ew leşker bûn ku yan ji şer vedi-geriyan yan jî diçûne şer." (BMS, r. 36). Îshaqê Lîvzerîn dişibe derwêşekî, xwe û ruhê xwe bi mosîqayê perwerde kirîye, xwedî bedewîyekê ye lê civak wê bedewîyê nabîne. Bi gotina Celadet bes ew û Serheng dibînin. Li gorî Îshaq "Mosîqa dengê Xwedê bi xwe ye, dengê wî ye di henaseya wî ya herî saf de." (BMS, r. 41). Gava cara ewil mamosteyê wan li bîlûrê dixe Celadet hîs dike ku difire. Celadet çavêن xwe dimiqîne û hest dike ku li esman e. "Bo yekem car piyêن wî li ser erdê bilind dibûn, bo yekem car didît ku valatiyeke mezin dikeve navbera laş û rihê wî... hest dikir ku laşê wî temam sivik û sa-nahî xwe amade dike bo jibîrkirineke kûr." (BMS, r. 41-42). Hogirtî û mosîqa dikan ku Celadet cara ewil xwe aşbûyî hîs bike. Piştî ku Serheng Qasim û Îshaqê Lîvzerîn ji alîyê Samîrê Babilî ve têن kuştin û Samîr Celadet dibe Bajarê Sozanîyan û vê carê Daliya Siracedîn û Dr. Mûsayê Babek vê rolê hildigirin. Celadet bi dehan trajedî bijî jî, sê caran ji mirinê vegere jî însanekî bextewar e, Bextiyar Elî wî tu caran bêhogir nahêle. Daliya û Dr. Mûsa birînên wî yên fîzîkî jî ruhî jî dipêçin û wî pak dikan. Piştî ku şer digihîje Bajarê Sozanîyan vê carê Samîrê Babilî digihîje hawara wî, çendî ku kujerê wî yî berê be jî ji bo demekê bi hevaltîya xwe alîyê Celadet dike. Di wê navê da Celadet kesekî din nas dike ku ew kes derîyên nû li pêşîya wî vedike. Ew jî Mistefayê Şewnem e. Celadet bi van gotinan behsa wî dike. "Çaremîn û dawî mirovê rastîn û mezin e ku ez li ser vê stêrkê dibînim, li gel Îshaqê Lîvzerîn û Dr. Babek û Daliya Siracedînê vê cargoşeya mezin dirust dike ku ez di nav de xaleke piçûk bûm û min bangewazên dûr û jevveqetiyayî pêkve girê didan..." (BMS, r. 247-248). Dema ku Celadet ji mirinan vedigere, di rîyan da winda dibe, sêwî û etîm e, li kuçe û kolanan dijî û ji nedîyarîyekê ber nedîyarîyekê din diteriqe, her tim hogirek li kêleka wî peyda dibe. Elî para herî mezin ya hogirtîyê dike para Celadet û her carî jî trawmayêن Celadet bi saya wan hogirtîyan aş dike, pak dike.

Em dibînin ku di romanên navhatî da rola herî muhîm ya pakkirinê li ser pişta psîkanalîstên cigîr e. Di nav wê bêparîyê da însan dermanê însan in, di nav bêparîyê da her kes bi saya keseke/î din serederî bi trawmayêن xwe ra dike. Ji bo hev guhdarêñ empatîk in. Giringîya ku Bextiyar Elî daye hogirtîyê di heman demê da işaretî nebûnîya mekanîzmayêن civakî û dewletî jî dike, gava karekterên metnan di timtêl û hewalê xwe da dişewitîn û wan çaxan jî bes hogirek heye li cem wan.

### 3. Şîngirêdan

Şîngirêdan, ji bo pakbûnê hem ji alîyê rîtuelên herêmkî ve hem jî ji alîyê pisporan ve wekî berteka herî rewa û normal tê hilsengandin. John Bowlby qonaxên şînê bi

çar xalan diseniffîne. Qonaxa ewil tevizîn e. Mimkun e ji çend saetan heta çend mehan bidome. Ew pêvajo carinan ji alîyê bertekêن wekî diltengîyên kûr û hêrsa giran ve qut be jî mimkun e demeke dirêj bidome. Qonaxa duyem hesret û lêgerîna figura/ê winda ye ku çend meh û carinan bi salan jî didome. Qonaxa çarem belawelatî û qonaxa bêhêvîtyê ye. Di qonaxa çarem da kesê ku şînê girê dide kêm yan zêde xwe ji nû ve dide hev. (Bowlby, 1980, r. 85). Elisabeth Kübler-Ross jî, şînê di pênc qonaxan da diseniffîne: Înkar, hêrs, bazarkirin, depresyon û qebûlkirin. (Kübler- Ross, 2008, r. 1). Laurence J. Kirmayer û Gail Guthrie Valaskakis dibêjin şîngirêdan ne bi tenê ji bo pakbûn û şîfadîtinê muhîm e di heman demê da gava em şîna windayêن xwe girê didin rabirdûyê jî bi bîr tînin, tevkarî li hafizaya dîrokî, nasname û nerîtê dikan. Şîn bi xwe ra nûbûnê jî tîne, ku mirov şînê red bike di heman demê da windabûna nasên xwe jî red dike. (Kirmayer û Valaskakis, 2009, r. 456).

Şîn, li gorî hemû nerîtan, dînan û bawerîyan tekane derfeta xatirxwestinê ye; kesê mayî piştî ya/ yê çûyî bi saya rîtuelên şîngirêdanê hem hezkirina xwe ifade dike, hem xatir dixwaze, hem jî şîfa dibîne. Çendî ku li gorî dînan bi qasî jidayîkbûnê mirin jî heq e, dîsa jî ew kêfxwesîya ku bi zayînê ra xwe dide der, di mirinan da dewsa xwe dide kesereke kûr, ji ber vê çendê ye ku şîn rîtueleke êşdar e, lê dîsa jî ji bo qebûlkirinê, rûbirûmanê û şîfadîtinê tekane rê ye. Tammy Clewell di kitêba xwe ya bi navê *Mourning, Modernism, Postmodernism* da şînê di çarçoveya edebîyatên modern û postmodern da hildisengîne. Bi modernîzm û postmodernîzmê ra formên şînê çawa dirûv guhirandin; modernîzm û postmodernîzmê çawa dirûveke melan-kolik li şînê bar kir, vê yekê gengeşe dike û berra jî idîaya xebata xwe dîne pêş. Li gorî wê şîn ji holê ranebûye û bi heman fonksîyonên xwe li dar e. (Clewell, 2009, r. 13). Hin birîn, êş nehatin qeydkirin, dîroka hin gelan, vedekirîyan nehate nivîsîn, îroroj gelên ku hatine kolonîzekirin û şexs yan komikên ku wekî êndin hatine senifandin li pey hafizayeke kolektîf in. Jin, reşîk, çermsorêن Amerîkayê û hemû şexs û civakên ku dengê wan hatiye tepisandin hê jî li pey çareserîyen pakbûnê ne. Clewell vê rewşê bi têgeha "ongoing convalescence/ pakbûna berdewam" ifade dike. Li gorî wê ev pêvajoya berdewam di heman demê da redkirina teselîyê ye û şîneke neqedîyayî temsîl dike, ji ber ku rabirdûya êşdar û bandorêن wê yên trawmatîk hê kuta nebûne, belkî bi saya pakbûna berdewam û şîna berdewam însan bikaribin xwe ji encamên kujer ên rabirdûya êşdar bişon. Estetîka modernîst ferasetên çandî dan ber êgir, postmodernîzmê şîn û rîtuelên çandî kêmî xwe dît. (2009, r. 3). Clewell romanêن William Faulknerî û Virginia Woolfî di vê çarçoveyê da dinirxîne û idîa dike ku ew teselîyê red dikin û şîna berdewam ya windakirinê temsîl dikin. (2009, r. 6). Poul Connerton jî tiştên bi heman rengî niqaş dike. Ew jî idîa dike ku şîn di heman demê da alîkarîya dîrokê dike, ew dîroka ku nehatîye nivîsîn bi saya şînê ji nû ve tê nivîsîn û şîn dike ku ew dîrok meşrûyetê bi dest bixe. Dibêje: "Gava em balê dikişînin li ser rabirdûya êşdar bi tenê meşrûyetê bi dest naxin di heman demê da wê rabirdûya êşdar temam jî dikin. (Connerton, 2011, r. 29). Gelên bindest, şexs yan komên xwedî dezawantaj di heman demê da ji şînê jî bêpar mane. Şertên ku tê da jîyane, şîdetâ domdar û traw-

mayên kerr kiriye ku rojek be jî destêن xwe nedin li ser zikê têr; di heman demê da di wan şertan da nemimkunîya şîngirêdanê jîyane.

Romanê Elî yên navhatî jî taybetîyê wereng dihewînin ku mimkun e bibin na-venda nîqaşen wiha. Berî her tiştî divê em bêjin ku di her pênc romanan da jî şînên veşartî yên berdewam hene, gava em bala xwe didin formên şîngirêdanê yên di met-nan da, em rastî rîtuelêن nas ên Kurdan nayên. Ne kesek porê xwe vedirû, ne kesek rûyê xwe dirûcikîne, ne kesek bi rojan digirî, ne por û rîyê kesekî tevlîhev dibe, ne jî kesek bi kulman sîngê xwe dikute. Ji ber ku trawmaya kerr li dar e; şert û mercen ku trawmayan diwelidînin hê jî li dar in. Kolonyalîzm, şerê navxweyî, komkujî, koç-berî, xizanî, bêkes û bêkûsî, rolên zayenda civakî, parçewelsebûna axê, malê, welêt bi xwe ra ‘nemimkunîya şîngirêdanê’ jî tîne. Bi rastî, dema ku em li fiksîyonâ romanan dînhîrin, em dibînin ku wext û rehetîya kesî tuneye ku bisekine û şînê bigire. Sew-sen piştî ku Kameran ji alîyê Amûnîyan ve tê kuştin bi metaneteke nedîtî pêşwazîya cinazeyê wî dike û nagirî, bi tenê laşê Kameran bêhn dike û bi destê xwe cilên wî ji wî derdixe û bes wan yadgaran vedîşere. (QBX, r. 382). Dûra şîna wê ya berdewam bi salan didome, çarek din ji qesrê dernakeve, careke din tevlî însanan nabe. Ew qesr bi awayekî dike mezelê wê, ta ku Huzar mezin dike û ji malê diçe ew jî mirina xwe ve-dixwîne û dimire. Mirin, trajedî, trawma rûtîna jîyana wan e, ku bixwazin şînê bigrin dê şîna kê bigrin şîna kê negrin nizanin. Elî loma şîneke şenber naxe para karakteren xwe, her karaktereke/î wî xwedî şînê berdewam in.

Di Hinara Dawî ya Dinyayê da kes ji bo demeke dirêj şîna kesekî nagire. Silêmanê Mezin piştî ku kurê wî Mihemedê Dişlûse ji ber eşqa xwe dimire, bi hêsanî vê trajedîyê qebûl dike û bes ji Xwîşkêن Spî dixwaze ku li ser gora kurê wî stranan bêjin. Silêmanê Mezin hefteyek piştî mirina kurê xwe careke din tevî nobedarên xwe tê mala Xwîşkêن Spî. Ew wekî xelkê, wan keçikan, bi taybetî Lavlavka Spî tawanbar nake. Bêtir xwe tawanbar dike û derbarê xwe da hin tiştan dibêje. Bi van gotinan rasteqînîya jîyana wan, rûtîna jîyana wan dide der. Mirin ew qas li jîyana wan rûniştiye ku nikarin şînê dirêj bigirin. “Ez li we venâşîrim, ez mîrkuj bûm, ez mamosteyê mirinê bûm... Ez fêr nebûme ji bo rehm û dilşewitînê lava bikim. Şoreş li pey şoreşê û şer li pey şer ez di wan çîyayan de pîr bûm.” (HDD, r. 67). Ne bi tenê bavê Dilşûse, Xwîşkêن Spî û Seryasê Subhdem jî şîneke dûr û dirêj nagirin, jixwe zêde nakişîne Seryasê jî tê kuştin. Vê carê şîna Seryasê Yekem û ya Dilşûse dibe para Seryasê duyem. Muzeferê Subhdem ji hemû şînan bêpar dimîne; ji ber ku pêşiyê hîn dibe ku Seryasê Yekem hatiye kuştin, paşê hîn dibe ku Seryasekî -yê Duyem- din heye ew jî li cîyekî dûrîdest girtî ye. Bes ne ev qas Seryasekî din, yê Sêyem heye ku ew jî di agirê şer da şewitîye, bûye kût. Muzeferê Subhdem şîna kê bigire ya kê negire nizane.

Nemimkunîya şîngirêdanê dibe para Xendana Piçûçik û Fetaneyâ Xemgîn jî. Piştî ku wan mecbûr dîkin ku înfaza xwîşkêن xwe temâşe bikin, xwe di nav merasîmeke sosret da dibînin. Çavê metê her tim li ser wan e, ne dikarin dengê xwe derxin, ne dikarin hawar bikin, ne jî dikarin xwe bigihînin xwîşkêن xwe. Ew kesen ku Perwane

û Mîdyayê ûnfaz dîkin, layiq nabînin ku wan li goristana gund veşérin, ditirsin ku ew keçik mirîyên wan bilewitînin. Xendan û Fetane temaşe dîkin, li derdora xwîskêñ wan perperîk difirin. Birayêñ wan di dawîya merasîmê da tivingêñ xwe bilind dîkin û gulle dibarînin wan. Heq e ku bira û mîrêñ ji malbatêñ wan vê peywira birûmet bi cî bînin. "...meleyek hate pêş û bi çend fermanan hemû agahdar kirin ku ji bilî bira û merivêñ keçan heqê kesekî din yê besdarîkirinê nîne..." (EP, r. 302). Xendan û Fetane li hevdu dinhêrin û têdigihîjin ku Perwane û Mîdyâ mirî ne; çavê xwe digirin "... ew mirî bûn, me dinerî û me mirina wan li ezman û di nav berf û li ser rîyan didît, cîhan piştî vê pêzanînê germtir, xemgîntir û dojehîtir dixuya." (EP, r. 303). Hevdu hembêz dîkin û digirîn. Ew civak wan ji şînê jî bêpar dihêle, çunkî li gorî feraseta wan şerm e ku mirov piştî du xwîskêñ xirab bigirî û şînê bigire.

Di Bajarê Mosîqarêñ Spî da her kes di Erafekê da dijî. Celadet bi caran ji mirinê vedigere, di navbera mekanêñ berdest û alternatif da bi caran rêuîtîyan dike, Celadet tu caran derfeta şînê bi dest naxe, Daliya bi salan li pey şopa Basim Cezaîrî digere, Samîr Babilî dixwaze kîfareta súcêñ xwe bide, hem mexdûrêñ Samîrî hem malbatêñ wan dixwazin Samîr bê cezakirin, Şaroxê Şarox wekî temsîlkarê hemû bêmirazan di navbera du dînyayan da tê û diçe. Jîyan heta gewrîyê bi trawmayan tije ye. Di vê atmosfere da nemimkunîya şînê ji bo karakterêñ Bajarê Mosîqarêñ Spî jî li dar e. Mexdûrêñ Samîrî û di şexsê wî da mexdûrêñ zilma kolonyal piştî dadgehkirina Samîrî hinêk be jî aş dîbin û şîna xwe ya taloxkirî digirin. Daliya bi salan şîneke veşartî digire û tarmayîyan dike şîrîkê şîna xwe ku ew xeyaletêni piçûk bi şevan hogirtîya Daliyayê dîkin. Em gava li wan xeyaletan û rola wan dinhêrin em dibînin ku ew xeyalet di konteksta hilsengandinê Esther Peerenê da xwedî fonksîyon dîbin. Peeren, hebûna xeyaletan bi vî rengî hildisengîne. "Bandora dîrok û nerîtê ya li ser şert û mercêñ civakî, hûrgîlîyêñ trawmayê û hafizaya şexsî û kolektif; bandorêñ teknolojîyê; dûrxistin, jîholêrakirina pîvanêñ normêñ civakî yên di derbarê zayendê da; nijad, çîn, gazî xeyaletan dîkin." (Peeren, 2014, r. 2). María del Pilar Blanco û Esther Peeren di xebateke din da dîsa vê mînvalê da xeyaletan hildisengînin. "Pirî caran xeyaletêni manewîyatê yên ku rihetker in bi dilxweşî tên pêşwazîkirin." (Blanco and Peeren, 2013, r. 3). Daliya şîna xwe bi temamî talox nake, nîsbî be jî digire. Tarmayîyan piçûk ên ku derdora wê dipêçin xeyaletêni rehetker ên manewîyatê ne. Peeren zimanê vegêranê û yê trawmayê mîna hevalê razanê hildisengîne, ji bo ku mirov bikaribe bi herdûyan ra serederî bike, dikare serî li aporîyayan û kînayeyan bide. Ev ne cîyê methelmanê ye. Peeren xeyaletan bi vê hişmendîyê hildisengîne. (Blanco and Peeren, 2013, r.16). Xeyalet ne bi maneya xwe ya occult, bêtir bi maneya xwe ya saxker, pakker li dar in, hewcetîyek in. Jîyana berdest, Daliya ji malbatê, ji heval û hogiran bêpar hîştiye, lê belê ji bo ku mirov li ser pîyan bimîne hewcetî bi piştgîrîyan heye, hebûna xeyaletan tam li gorî vê hewcedarîyê hatiye şêwandin. Daliya û xeyaletêni piçûk şîneke bêdeng digerînin. (BMS, r. 236). Şevezê Daliya mîna dînan dide rê Celadet jî dide dû. Ew digihîje nêzî wan deryayê bêşînor û fetisîner ên tarîtyê û li wir disekine, ta rast li wir dengekî bisaw bilind dibe, hawara bi hezaran mirovan tev li givegiva bahozê

û reşebayê çolistanê dibe. Li alîyê din yê wî dîwarê bilind û wan perdeyên metirsîdar ên tarîtyê, di nav zilmateke bê mînak de, Celadet bi hezaran tarmayî dibîne ku hawar dîkin, hezaran tarmayî wek bayekî ber bi derwazeya cehnemê wan bifirîne. Wekî ku destek bi zorî wan ber bi cîhekî tirsnak ve bibe, wisa diqîjîn, wek dîmenike qîyametê dixuye. Bi hezaran tarmayî di navbereke dîyarkirî da direvin û vedigerin, ên ku direvin têkelî wan dîbin, bîlez vedigerin. Yênu ku digihîjin dawîyê, wek hêzeke sêhrawî wan bizivirîne, dîsan têne destpêkê. Celadet dibîne ku ji cîhekî dîyarkirî ve dibe, tarmayîyan dixwe û tarmayîyan ber bi nav cergê xwe qurt dike, yênu ku dikevin bin erdê, hawarek ji wan bilind dibe ku pêstir ew qet guh lê nebûye, hawareke ku divîya ew guh lê bigire da ku nebihîze... "Min li wan tarmayîyan êşkişandî dînihêrî ... min guh didayê û ez ditirsiyam ew hawar heta mirinê di serê min de bin." (BMS, r. 236-237). Mekanên trawmayan ci qas bêjî kaotîk in, ji saxan bigire heta mirîyan her kes di vê atmosfere da êş dikişîne, şînên ku nehatine girêdan, mirîyan jî saxan jî didin ber agirê xwe, rolên pêknehatî her kes nivîşkanî hîştiye. Heta ew şîn neyê girêdan yê nivîşkanî bimînin.

Ew bedewî û êlên windabûyî yêna rêya wan dikeve ser wan goran, guhê wan li nalenal û hawara mirîyan bûye ku di bin erdê de dîkin nalenal. Hindek ji wan leşkerêne têne vî bajarî, hikayeta wan tarmayîyan birîndar vedigêrin ku li ser seqam, rê, lêva cogeh û peravên rûbaran sergerdan û beredayî ne û bi xwîmî hawarê dîkin. (BMS, r. 143).

Ne bi tenê sax, mirî jî li pey pakbûnê ne. Şîna nemimkun bûye sebeb ku her yek bide li pey çareserîyekê. Nivîşkar trajedîyan dide dû trajedîyan û nahêle ku karakterên wî bi dilê xwe şîna xwe girê bidin; ji ber ku rasteqînîya jîyanê vê derfetê na-bexşîne wan. Loma ne bi tenê şîna karakteran şîna metnan bi xwe jî şînên berdewam in û pakbûna berdewam ne bi tenê ji bo karakteran ji bo metnan jî li dar in. Metnên Elî bi xwe şînê girê didin, bi saya şînê dîrokê ji nû ve dinivîsînin, bi saya şînê rûxandinê kolonyalîzmê tînin rojevê, bi saya şînê derfetên pakbûna derengmayî dibexşînin gelekî bindestkirî, bi saya şînê dengêne tepisandî digihînin dinyayê.

#### 4. Nivîşîn

Cathy Caruth *Unclaimed Experience: Trauma, Narrative, and History* (1996), Shoshana Felman û Dori Laub *Testimony: Crises of Witnessing in Literature, Psychoanalysis, and History* (1992), û Dominick LaCapra *Representing the: History, Theory, Trauma* (1994) teorîyên xwe bêtir di ser metnên edebî ra pêş xistin û wê geşedanê kir ku metnên edebî bêtir bibin corpusa teorîya trawmayê. Em ji xebatêne wan têdi-gihîjin ku edebîyat, nivîş, vegêran bi qasî ku ji bo temsîla trawmayan muhîm e, ji bo pakkirina trawmayan jî ew qas muhîm e. Md Abu Shahid Abdullah dibêje: Jîyana bi trawmayê ra nayê wê maneyê ku trawma bi temamî însanan dadiqurtîne û diperçîqîne. Berevajî, ci devkî ci jî nivîskî bi vegêrana çîrokê ra şexs bi rabirdûya xwe ra rûbirû dimîne, kontrola çîroka xwe û jîyana xwe bi dest dixe û nasnameya parçebûyî cardin radixe li ber çavan. (Abdullah, 2020, r. 19- 20). Eugene L. Arva jî dibêje: "Ci devkî

ci nivîskî be, ziman jî di ontolojîya xwe da potansîyeleke dermankirinê dihewîne.” (Arva, 2011, r. 153). Nasnameya parçebûyî, dengê êndin yê ku hatiye tepisandin bi saya nivîsê; bi zimanê xwe, dara xwe di cîhana vegêranê da diçîne. Ewald Mengel, Michela Borzaga û Karin Orantes ku edîtorên kitêba bi navê *Trauma, Memory, and Narrative in South Africayê* ne, di destpêka kitêbê da dibêjin ku: “Trawma, hafiza û vegêran bi hev ra di têkilîyeke nêz da nin; çunkî awayekî rûbirûbûna rabirdûya trawmatîk ya kes yan neteweyekê tê wê maneyê ku bi vegêrana çîrokê ra hafizaya trawmatîk (hafizaya germ) vediguherînin hafizaya vegêranê (hafizaya sar). (Mengel & ûyd... 2010, vii). Hem romanên navhatî yê Elî bi xwe hem jî nivîsarîya karakterên Elî xizmetî vê ferasete dikan.

Di romana Êvara Perwaneyê da kesa herî aram, têgihîştî Mîdfa ye. Taybetiya ku Mîdyayê ji yên din diqetîne, nivîs e. Mîdfa hem trawmayek hilgirtiye hem jî bi nivîsê ra aram dibe. Nivîs roleke terapotîk hildigire. Bextiyar Elî qîmeta ku dide qeydê û nivîsê di vê romanê da dike para Mîdyayê. Mîdfa divê karê xwe bibe serî. Mîdfa şahid e. Haya Mîdyayê ji trawmaya wê heye. “Hemû tişt diqedin, divê şahidek bimîne, şahidek ji hemû dinya û demsalan bibeqtir be. Dibêje: “Perwane, roja heşrê ew roj e ku mirov nikare binivîse, roja axretê, ew roj e ku nivîsandin tê de bidawî tê, ku êdî mirov nikare tiştan bi nav bike, dinyayê wesif bike.” (EP, r. 239). Mîdfa bi saya nivîsê, Fetane jî bi saya hîkayetbêjîyê serederî bi trawmayêne xwe ra dikan. Her du jî bi awayekî dikarin li hember hemû trajedîyan li ser pîyan bimînin. Mîdfa li daristanê ji bo Perwaneyê pişt û pal e, Fetane li dibistanê ji bo Xendanê. Mesûme li ser wê fikrê ye ku Fetane çîrokbêjeke baştir e; lê belê çîrokbêjeke devkî ye. Xendan dibêje: “Divê hemî çîrok herin ser kaxezan, yan na wê bimirin... ji min re ev çîrok ne çîrokek e û hew, lê anîna Perwane bo vê cîhanê ye.” (EP, r.17). Xendan li pey defterên bîranînen Mîdyaya Xemgîn e. Loma bi Nesredîn ra ketiye pêwendîyê. (EP, r.21). Ji Nesredîn van defteran dixwaze. Ev defter qeyda hafizaya demekê ne. Îhtîmal e xwînerê bi saya wan agahîyan çîroka Perwaneyê hîn bibe. Rojek ji rojan Nesredîn defteran di serpê-ckeke spî da datîne li ber Xendanê. “...dizanibû serpêhatîyekê datîne ber destê min ku qehremanen wê yan mirî ne, yan bar kirine û yan xwe di devereke vî welatî de veşartine.” (EP, r. 22). Defter çîma ev qas muhîm in? Elî di destpêka romanê da fokûsa romanîsîya xwe eşkere dike ku ew jî giringîya ‘nivîsê, qeydkirinê û hafizayê’ ye ku em dikarin bêjin ev taybetî di hemû berhemên navhatî yêne vê xebatê da xuya ne. Xendan û Fetane bi salan li Dibistana Xwîşkêni Tobekar, bi saya vegotina hîkayetan li ser pîyan dimînin. “Em di navbera van herdu cîhanan de rawestiyane û dinêrin, çîrokan vedibêjin, çîrokbêj ne girêdayî tu dinyayê ne.” (EP, r. 307). Çîrokbêjî seknek e li hember hemû zilm û zordarîyan. Çîrokbêjî ne bi tenê qîmeta hafizayê dinimîne, di heman demê da azadî û îradeya nivîskar jî dinimîne. Nivîskar bi saya çîrokbêjîyê, nivîsê li hember serdestî û otorîteyan jî radibe, dibe nûnerê heqîqetê ku bi salan hatiye bêdengkirin. Tirsa Perwaneyê ya herî mezin jibîrcûn bû. Nivîskar ji bo xatirê hemû Perwane û perperîkan xwe davêje bextê nivîsê, tomarkirinê. Hafiza û nivîs yekane dermanên vê jibîrcûyînê ne. Xendan û Fetane bi xwendinên kûr mijul dibin,

bi hîkayetan û bi hêvî ne ku "...hinek sal bi rê de bin, di salnameyên wan de êvara perwaneyan tunebe." (EP, r. 307). Xendan pişti ku nivisîna çîroka wan salan, wê trajedî, têkçûn û trawmayê diqedîne, gawa dibêje "Êdî bes e." ew bêhna ku bi salan e hîs nedikir çardin vedigere jîyana wê. Xendan pak dibe, "Xwedêyo, Xwedêyo... ew bêhn bi xwe ye." Vedigerim balkonê, destê xwe bilind dikim, hewaya bi bêhnê dagirtî ya wê êvarê hildimijim û dikim hawar, Ev bêhna pak ya rîhanan e, bêhna pak ya rîhanan." (EP, r. 323). Mîdfa, wê rojênu ku li daristanê jîyane, şahidîya wan rojan dike û wan rojan bi nivîsê qeyd dike, Xendan hem serpêhatîyên xwe hem ên Fetaneyê, hem jî çîroka Perwane û Mîdyayê qeyd dike. Xwendan ji destpêka romanê heta dawîya romanê tevdigere ku Perwaneyê nede jibîrkirin. Ji nivîsê çêtir tu rê nîne ku nav û çîroka Perwaneyê mayînde bike û di heman demê da, Xendan pê ra bikemile û trawmayên xwe aş bike.

Di Bajarê Mosîqarê Spî da gava Celadet hîn dibe ku Samîrê Babilî kujerekî bê-rehm bûye û bûye sebebê mirina mamoste û hevalê wî, gava dibihîze ku Samîrî faîlê bi dehan, sedan sûcan e li ser tolhildanê serê xwe diêşîne. Di nav du agiran da dimîne, Samîr hem faîl e hem jî mexdûr e, nizane wî çawa bi nav bike, nizane ji bo wî ci hîs bike. Dr. Mûsa digihîje hawara Celadet. Dr. Mûsa Babek şîretan li Celadet dike:

Min bawerî bi tiştekî din heye, min bawerî bi bedewiyê heye. Mirov nikare dadperwer be lê dikare di bedêla eş û azarê de bedewiyê dirust bike... tola herî mezin ji neheqiyêni dinyayê ew e ku mirov helbestvan be, mosîqayeke bedew bijene, tabloyekê çêke ku li hember sersam bimînin, ji wê zêdetir ti dadperweriyek tune ye. (BMS, r. 226).

Ev tez di heman demê da teza romanê û teza Elî bi xwe ye. Arşîva Okyanosa Hawarê ji bo vê armancê hatiye sazkirin. Bi sedan, hezaran berhemên hunerî loma li wir hatine veşartin û ya herî muhîm jî Bextiyar Elî hê di rûpela ewil da berê nivîska-rekî dide Kurdistanê, ew kes li Ewropayê dijî, da ku biçe û çîroka Celadetê Kotir bini-vîse bi rê dikeve. Hem roman bi xwe hem qeydên Elî Şerefyar bi hev ra diherikin. Dr. Mûsa gava behsa nebûna dadmendîyê dike dibêje: "...zulm li ser tirsandina mirovan ya ji mirinê kar dike, lê bedewî berevajî, li ser vê yekê kar dike ku bibêje mirovan tu namirî, tu rêwî nînî, tu ji nav naçî." (BMS, r. 227).

Elî amaje bi hêza hunerê dike, huner hem dikare trawmayan temsîl bike hem jî dikare trawmayan pak bike. Trawma bi tolhildanê, bi rikberiyê heyfildanê pak nabin, axivtinê Dr. Mûsa û Celadet vê angaşa romanê dipeyîtînin. Doktor dibêje: "Dadperwerî ew nîne zaliman bikujî, ew e ku tiştekî cuda bixî nav rihê zulmê. Dadperwerî ew mosîqa ye cihê mirinê digire, ew awaz e cihê tîrsê digire, ew nîgar e cihê eş û azarê digire..." (BMS, r. 228). Huner li gel bedewiyê dadperweriyê çawa dibexşîne? Elî amaje bi hêza hunerê dike, huner mafê axivtinê dibexşîne însanan, bi axivtinê ra dîwarên bêdenkirinê têن şikandin ku ew bêdenkirin pirî caran pişta xwe dispêre yasayan. "Mirov bi hawarekê bersiv dide ku digihîje ebediyetê û vedigere, ew hawar, hawara mirov e..." (BMS, r. 229). Ew hawar edebîyat bi xwe ye, rêya herî dirûst ya

hawarê, eşkerekirinê, pakbûnê edebîyat bi xwe ye. Însan ançax bi saya hunerê, edebîyatê ji alîyên xwe yên qirêj paqij dibin, dibin însanên saf. Roman li ser vê angaştê ava bûye û bi saya hunerê, nivîsê karakterên xwe dihewîne û aş dike. Celadet piştî salan, piştî gelek serpêhatîyên trawmatîk di dawîya romanê da ji her kesî xatir dixwaze. Berî ku ji bo heta hetayê biçe Bajarê Mosîqarê Spî bi emdamên Tîpa Mosîqayê ya Gemiya Spî ra dicivin. Her kesî hemû alavên xwe yên mosîqayê anîye. (BMS, r. 700). Elî Şerefyar kitêba Celadet nivîsîye, Celadetê kopîyeke kitêbê bibe Okyanosa Hawarê. Elî Şerefyar piştî ku Celadet ber bi Bajarê Mosîqarê Spî diçe, winda dibe, bi salan kitêbê naweşîne. Bi salan li benda vegera Celadet dimîne, bi salan li benda nihênyê dîtir dimîne. Di vê navê da du caran vedigere Kurdistanê. Li balafirgehan dide dû şopa Şaroxê Şarox. Li hêvîyê ye ku Daliya ji cîhekî derkeve.

Hemû meraqa van salên min ew bû ku ez vê tekstê bigihînim wî cihî ku Celadetê Kotir behsa wê dike, sînorek di navbera jiyan û mirinê de. Sînorek ku bikare ji wir ve, di navbera niha û ebediyetê de bilîze. Rojekê ji rojan piştî çar salên karkirina berdewam, min biryar da ku êdî her çawa be, divê ev teksta çap bibe. (BMS, r. 705).

Di dawîya romanê da Elî Şerefyar ji bo çapkirina kitêbê cardin diçe Kurdistanê. Diçe pêşîya wê hotelê ku niha avahîyeke modern ya sikûsar e. Ew kîlîya ku bikeve çapxaneyê xortek bangî wî dike û nameyekê radestî wî dike, gava vedike dibîne ku li xwarê nameyê nivîsiye 'Celadetê Kotir', nameyê naxwîne, dixe bêrîka xwe û dikeve dikanê. Ji Celadet, Celadetê Kotir, Celadetê Qeqnes xatir dixwaze. Ya ku bimîne yê nivîs be.

Romana Apê Min Cemşîd Xan Ku Hertim Bê Ew Li Ber Xwe Dibir jî giringîya nivîsê angaşt dike; lê belê ne bi awayekî eşkere. Cemşîd xan cara ewil di hevdeh salîya xwe da dikeve girtîgehê û şkenceyên xedar dibîne. Piştî wê şkenceyê, êdî wekî kaxizekî ye, êdî bayekî sivik jî wî dide li ber xwe û dibe. Ba tevahîya romanê û hemû serpêhatîyên Cemşîd dide li ber xwe, ta ku hemû jîyana xwe li ser laşê xwe dide nivîsin. Heta ku Cemşîd nekemile, heta ku Cemşîd ji trawmayênen xwe xalî nebe, pak nebe yê nikaribe çîroka xwe qeyd bike. Sebeba vê yekê çî ye, ji ber ku Cemşîd ne carekê, bi caran biryar dide çîroka xwe binivîse lê her carî averê dibe. Rojekê dîsa Cemşîd xan biryar dide ku bîranînen xwe binivîse. Ev biryar Salar xan gelek kêfxweş dike, li gorî wî "ew daxwaza xan nîşana wêrekîyeke mezin û amadebûneke nehêni bû ji bo rûbirûbûna bi xwe re" (CX, r. 102). Lê balkêş e dewsa ku behsa serpêhatîya xwe ya rasteqîn bike, behsa geştekê dike ku "ew serdarê keştiyeke mezin bûye, dêwêne mezin hatine pêşberî wî, perîyên avê ew xapandine, ketiye giravekê ku hemû xanimên lê dijîn gelek qeseng bûne, li deverekek dîlê cinawerekî mezin bûye ku bes çavekî wî cinawirî hebûye. (CX, r. 102). Li gorî Smayîl, xan çîroka rêuwîtîya Odysseus bi tevlîhevî nivîsiye. Nizanîn xanê kîngê rastîya xwe qebûl bike, xanê kîngê vegere xwe? Herî dawî gava Cemşîd dîsa li ber bayê dikeve, vê carê zêde dûr naçe, ba wî dibe li milkê mesûlekî datîne. "Mesul endamê bîroyeke sîyasî ya partîyekê ji partîyên me yên mezin bû, navê wî Şasîwar Begê Hîcî bû." (CX, r. 115). Şasîwar Beg, Cemşîd

dike qefesekê û di şahî û vewwendinên xwe da wekî meymûnekê bi kar tîne. (CX, r. 117). Piştra Cemşîd ji destan derbasî destê din dibe, di dawîyê da wî difroşîn kompanîyeke tirkân. Cemşîd xan li bajêrê listikê wek pêlîstokekê tê bikaranîn. Çaxê bi saya televîzyonê haya Salar xan ji vê yekê çêdibe, radibe diçe wî bajarî, piştî rojan bi planeke baş dikare Cemşîd ji wir birevîne. Tê malê, Cemşîd bes dixwaze bimire, ew qas ji rumeta xwe daketiye ku xêncî mirinê tu çareserîyê nafikire. Salar xan pêşnîyazî wî dike ku ji vî welatî biçê. Lê Cemşîd xan her cara ku diçe winda dibe, her tiştî ji bîr dike, loma naxwaze biçê. Dîsa bi pêşnîyaza Salar xan ressamekî tattoyan peyda dikan, ew ressam hemû çîroka Cemşîd xan li ser laşî wî dinivîse. Êdî biçê ku, yê çîroka xwe jî bi xwe ra bibe. Şevekê Salar xan û Cemşîd xan ji hev xatir dixwazin û cara dawî Salar xan wî ber bi esman bilind dike û benî wî berdide. Cemşîd xan piştî geşteke dirêj ya di tevahîya Asyayê da li cîyekî bi cî dibe. Li wir însan xwedîtî li wî dikan û giranîya laşî wî hino hino zêde dibe û êdî li ber bayê nakeve, dikare bi tena serê xwe bimeşe. Elî di dawîyê da berê Cemşîd xan dide dîyasporayê, li hember kolonyalîzma domdar, trajedî û trawmayê domdar tu çareserî ne mimkun e, hemû hewldanên Cemşîd wî ber bi tarîyeke kurtir dikişînin; keda wî dibe keda bersîs. Em dikarin çîroka wî wekî çîroka Bextiyar Elî jî hilsengînin, ji ber ku Elî piştî ku diçe dîyasporayê dest bi romannusîyê dike. Salar xan van agahîyan ji nameyeke Cemşîd xan hîn dibe, ew şev bayekî xurt li derive heye. Ew şev Salar xan ji bayê ew qas ditirse xwe davêje nav malê û biryar dide ku çîroka Cemşîd xan binivîse. Cara ewil e ku Salar xan li ser navê xwe ji bayê ev qas ditirse, Salar êdî ne ew Salarê berê ye; piştî serpêhatîya, şahidîya bi salan Salar êdî çîrokbehêjekî kemîlî ye, divê êdî binivîse yan ne bayê cardin çîroka wan bide li ber xwe û bibe. "Di destpêka sal 1979an da gava Cemşîd xan cara yekê hat girtin temenê wî hivdeh sal bûn..." (CX, r. 120- 126). Salar, piştî wan salêni dijwar û trawmatîk vediguhere çîrokbehêjekî. Celadet ji bo ku çarenûsa xwe biguherîne nade dû çareserîyê bêmane, êdî lingê wî erd digire. Qîmeta nivîsandinê û nirxa tomarkirinê dibe dawîya çîroka Cemşîd jî, Salar jî. Hasan Sun dîbêje "Cemşîd bi saya nivîsê xwegiramîya xwe ji nû ve bi dest dixe." (Sun, 2014, r. 107). Elî, pir eşkere amaje bi vê yekê dike, nivîsê bimîne. Cemşîd êdî xwedî hafiza ye, xwedî nasname ye û ya herî muhîm piştî ew qas trawmayan, pak dibe.

### Encam

Hilsengandinê Freud û Cathy Caruth ya "Qudusa Azadkiri" ya Tasso ji hêla gelek rexnegiran ve hatiye rexnekirin. Tancred du caran Clorindayê dikuje. Freud ev kiryarên Tancred wekî "dubarekirina pasîf" dihesibîne. Ji hêla Caruth ve wekî "dengekî paradoksi ku ji birînê derdikeve" hate binavkirin. Amy Novak dibêje ku ev nirxandin rê nadin xwendina serpêhatîya kesên din. "Ez difikirim ku çîroka Tancred, heke ew sehneya nivîsandina psîkanalîtîk be, eşkere dike ku axıvtina trawmayê li ser jêbirina dengê êndin e." (Novak, 2008, r. 32). Novak dîyar dike ku dengê êndin "dengê aporetic" e. Ji ber ku di çîroka Tasso da, Clorinda temsîla jineke Afrîkî ye ku ji cewhera xwe tê derxistin û ji bo zilamê spî kirasekî spî lê dikan. Clorinda du caran ji alîyê Tancred

ve tê kuştin, di her duyan da jî faîltîya Tancred tê tepiskirin û wekî mexdûr tê nîşandan. Faîltîya wî di bin navê trawmayê da tê meşrûkirin. Ev yek dike ku nîqaşek derkeve pêş. Gelo çîrokêñ trawmaya postkolonyal dikarin ci li qada psîkanalîtikê zêde bikin? Ji ber ku teorîya trawmayê ya klasîk, ku sînorêñ wê li ser têgihîştina trawmaya gelên Rojavayî ye, hem alîgir e hem jî dengêñ êndin nabihîze. Romanên Elî ji vê dualî-teya kolonyalîst wêdetir in, dengêñ alternatif pêşkêş dikin. Her çend di axivtin, xweî-fadekirin û şîroveyêñ karakteran da anakronîzmên eşkere hebin jî dengekî otantîk heye ku teknîkêñ vegotinê yên herêmî, rîbazêñ dermankirinê yên çandî dihewînin û ew cil û berg û dengê ku kolonyalîstan li wan bar kiriye ji xwe dikin. Romanên Elî bi van taybetîyêñ xwe dikevin nav cureya romanên trawmayê ya hemdem. Li gel ku tu carî enîyêñ şer û şîdetê bi rengekî berbiçav ranaxe li ber çavan jî, lê balê dikişîne ser bandora bûyerêñ trawmatîk ên li ser jîyana sîvîlan. Bi bêdengkirina şer û komkujîyan ra di jîyana însanan da ji berê heya niha bandorêñ mayînde pêk hatine. Ew hewl dide ku bandorêñ mayînde yên kolonyalîzmê rave bike û nîşan bide bê ka çawa ew mîrata trawmatîk di navbera nîşan da hatiye veguhestin. Çand û hafizaya kolektîf ji alîyê kolonyalîstan ve yan tê herimandin yan ji holê tê rakirin. Trawma vediguhere rûtînekê. Esmanê ku dagirker bi rengêñ xwe boyax kiriye, ne esmanê wan e. Di van metnan da şopa vê rûtînê bi hemû rengêñ xwe ve di nav vegêranê da xwe dide hîski-rin. Ew esmanê derewîn tê qelaştin. Di heman demê da Elî her carî rîyeke pakbûnê jî dide pêşîya karakterên xwe. Karakterên Elî bi saya rîwîtî, hogirtî, şîngirêdan û nivîsê serederî bi trawmayêñ xwe ra dikin û rîyêñ pakbûnê bi dest dixin. Ew rîyêñ pakbûnê di heman demê da kemîlînekî jî dibexşîne karakteran û ya herî muhîm metnêñ navhatî yên Elî bi xwe trawmaeke muhîm pêk tînin, trawmaya gelekî temsîl dikin û şahidîyê dikin, bê ka ew gel çawa li serpiyan ma û xwe pak kir.

### Çavkanî / References

- Abdullah, Abu S. (2020). *Traumatic Experience and Repressed Memory in Magical Realist Novels: Speaking The Unspeakable*. Cambridge Scholars Publishing.
- Arva, Eugene L. (2011). *The Traumatic Imagination Histories of Violence in Magical Realist Fiction*. Amherst, New York: Cambria Press.
- Bentley, N. (2017). *Narratives of Trauma and Loss in Caryl Phillips's Crossing the River and a Distant Shore*. URL: <https://journals.openedition.org/ces/4448>. DOI: 10.4000/ces.4448. ISSN: 2534-6695 r:29
- Bowlby, J. (1980). *Loss, Sadness and Depression. Attachment and Loss III*. London: Hogarth Press.
- Caruth, C. (1996). *Unclaimed Experience: Trauma, Narrative And History*. Baltimore: Johns Hopkins UP.
- Clewell, T. (2009). *Mourning, Modernism, Postmodernism*. London: Palgrave Macmillan.
- Connerton, P. (2011). *The Spirit of Mourning: History, Memory and the Body*. Cambridge University Press.

- Craps, S. (2013). *Postcolonial Witnessing: Trauma Out Of Bounds*. New York: Palgrave Macmillan
- Diagnostic and Statistical Manual of Mental Disorders -DSM IV-TR. (2002). *Fourth edition, Text Revision*. Washington. DC: Published by the American Psychiatric Association.
- Elî, B. (2012). *Apê Min Cemşîd Xan Ku Hertim Bê Li Ber Xwe Dibir*. (Wer: Besam Mistefa). İstanbul: Avesta.
- Elî, B. (2014). *Qesra Balîndeyên Xemgîn*. (Wer: Besam Mistefa). İstanbul: Avesta.
- Elî, B. (2015). *Êvara Perwaneyê*. (Wer: Besam Mistefa). İstanbul: Avesta.
- Elî, B. (2017). *Hinara Dawî ya Dinyayê*. (Wer: Besam Mistefa). İstanbul: Avesta.
- Elî, B. (2021). *Bajarê Mosîqarê Spî*. (Wer: Şehap Xalidî). İstanbul: Avesta.
- Felman, S. & D. Laub. (Edt.) 1992). *Testimony. Crises Of Witnessing In Literature. Psychoanalysis And History*. New York. NY and London: Routledge.
- Herman, J. (2015). *Trauma and Recovery: The Aftermath of Violence From Domestic Abuse To Political Terror*. New York, NY: Basic Books.
- Hunt, Nigel C. (2010). *Memory, War and Trauma*. Cambridge University Press.
- Keown, M. (2007). *Pacific Islands Writing: The Postcolonial Literatures of Aotearoa/ New Zealand and Oceania*. Oxford, UK and New York, NY: Oxford University Press.
- Kirmayer, Laurence J. & Valaskakis, Gail G. (2009). *Healing Traditions the Mental Health of Aboriginal Peoples in Canada*. Vancouver Toronto: UBC Press.
- Knudsen, E. R. (2004). *The Circle & The Spiral: A Study of Australian Aboriginal and New Zealand Maori Literature*. Amsterdam: Rodopi.
- Kurtz, J. R. (2018). *Trauma and Literature*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Kübler-Ross, E. (2008). *On Death and Dying What the Dying Have to Teach Doctors, Nurses, Clergy and Their Own Families*. London and New York: Routledge Taylor & Francis Group.
- LaCapra, D. (2001). *Writing History. Writing Trauma*. Baltimore. MA and London: Johns Hopkins University Press.
- Madsen, Deborah L. (2008). On Subjectivity and Survivance Rereading Trauma Through the Hei Ofcolumbus and the Crown Ofcolumbus, Vizenor, G. (Ed.). *Survivance: Narratives of Native Presence*. Lincoln: University of Nebraska Press.
- Mbembe, A. (2001). *On The Postcolony*. Berkeley. Los Angeles, London: University Of California Press.
- Mengel, E. Borzaga & M. Orantes, K. (2010). Trauma, Memory, and Narrative in South Africa. *Matatu Journal for African Culture and Society*. Number 38. Amsterdam- New York: Rodopi.
- Mlodoch, K. (2014). *The Limits of Trauma Discourse Women Anfal Survivors in Kurdistan-Iraq Studien 34*, Berlin: Klaus Schwarz Verlag.
- Najita, S. Y. (2006). *Decolonizing Cultures in the Pacific: Reading History and Trauma in Contemporary Fiction*. New York, NY: Routledge.

Novak, A. (2008). *Who Speaks? Who Listens? The Problem of Address in Two Nigerian, Trauma Novels Studies in the Novel*, Volume 40, Numbers 1 & 2, Spring & Summer 2008.

O'Connor, E. (2003). Preface For A Post-Postcolonial Criticism. *Victorian Studies*. 45: 217–46.

Peeren, E, & Blanco María del P. (2013) (Ed.) *Introduction: Conceptualizing Spectralities. The Spectralities Reader: Ghosts and Haunting in Contemporary Cultural Theory*. New York: Bloomsbury.

Peeren, E. (2014). *The Spectral Metaphor: Living Ghosts and the Agency of Invisibility*. New York: Palgrave Macmillan.

Sun, H. (2014). *Kürt Romanında Travma ve Psiko-Politik Çevrelenmişlik: 2000'den Sonra Yazılan Kürt Romani*. (Teza çapnebûyî). İstanbul Bilgi Üniversitesi Sosyal bilimler Enstitüsü Karşılaştırmalı Edebiyat Yüksek Lisans Programı. İstanbul.

Visser, I. (2012). The Trauma of Goodness in Patricia Grace's Fiction. *The Contemporary Pacific*. 24 (2), 297–321.

Visser, I. (2015). *Trauma Theory and Postcolonial Literary Studies. Humanities*. 4. 250–265; doi:10.3390/h4020250.

Visser, I. (2018). *Trauma in Non-Western Contexts. Trauma and Literature*. J. Roger Kurtz (Ed.). Philadelphia: Drexel University.

Vizenor, G. (2008). *Survivance: Narratives of Native Presence*. Lincoln: University of Nebraska Press.

### **Extended Abstract**

The use of the concept of 'trauma' for psychological damage in addition to physical injuries after the great tragedies experienced in the nineteenth century caused researchers and critics to attribute an interdisciplinary meaning to the concept. Especially after the First World War, the symptoms displayed by veterans returning from war, then veterans returning from Vietnam; the devastation caused by the Second World War and the situations and stories of victims and witnesses who survived the Holokoust expanded the boundaries of the concept considerably. The concept reached a breadth of scope that also defined many sociological conditions, including psychological disorders that had not been diagnosed before. The behaviors displayed by witnesses, victims and even perpetrators after many tragic events experienced in the world were gathered under the umbrella of PTSD. Although these behaviors could not be clearly placed in certain patterns, they showed some common characteristics. Behaviors such as silence, hysterical behaviors, long-term mourning, loss of ties with society, forgetting or suppression, trembling, and a sense of insecurity were exhibited. Although experts state that trauma inhibits a person's ability to narrate and speak, literary texts in particular have become the corpus of important research with their mission to refute this discourse. Cathy Caruth, Shoshana Felman, Dori Laub and Dominick LaCapra, who are among the deconstructionists developed trauma theory, have particularly focused on literary texts in their studies. With the developing world, one of the most debated topics has been coloni-

alism and postcolonialism, and the concept has gained many new dimensions. The most important objection of postcolonial researchers and critics was this: Classical trauma theory does not have a sufficient perspective to understand people in colonies. Another issue at the center of these discussions was methods of coping with trauma and methods of recovery. Classical trauma theory particularly emphasized therapeutic methods; however, this was not seen as a very possible path of recovery, especially for colonies and all marginalized and disadvantaged people. At this point, local beliefs, cultural codes, local narrative forms, forms of mourning, festivities and rituals were accepted as the paths of recovery that trauma theory considered. Postcolonial critics, in particular, have focused their studies on the effects of local codes on post-traumatic recovery, and in this context, non-Western literature and narratives have gained great prestige because literary works provide the opportunity to understand the tragedies experienced by indigenous people and all othered individuals and collectives, their subsequent traumas, and how they cope with these traumas; and to hear about what happened from them.

In this study, we aimed to determine the methods of Eli and her characters to cope with trauma and recover by focusing on five of Bextiyar Eli's novels. The novels *Hinara Dawî ya Dinyayê*, *Qesra Balîndeyên Xemgîn*, *Êvara Perwaneyê*, *Bajarê Mosîqarê Spî û Apê Min Cemşîd xan Ku Hertim Bê Li Ber Xwe Dibir*, which are the subjects of our study, contain many tragic events. The Helebce massacre, internal conflicts, great migrations, endless wars, gender and religion-centered problems and many other issues cause the characters of the novel to experience never-ending traumatic situations. In these novels, the traumas are event-centered but rather insidious and intergenerational. These texts, which we consider to be both trauma novels and postcolonial novels, offer the opportunity to record the memory of a society and to witness the traumas experienced by a society on an individual and collective basis. In these novels, Eli tries to heal his characters through various methods instead of burying them in post-traumatic silence. Some find ways to heal, albeit relatively, after journeys, some through friendships, some by trying to live the unlivable grief, and some by choosing to write. Another important point is the author's mission, which is that with these texts, the author rejects post-traumatic silence and tries to make visible the great tragedies and traumas experienced by the society he is a member of, the Kurds, which we can also consider as the author's method of coping with trauma. Writing and storytelling both develop empathy and tolerance, make the invisible visible, and enable people who have lost touch with the world to enter into dialogue with others. We believe that the novels in question, which are the subject of our study, convey these concerns and contain these qualities.